

## **Girr**

### **Terceme kir : Hecîyê Cindî**

1933

Neşra hukumata şêwra Filistanê Rewan 1933

Têmûrê Xelîl Mûradov

2- oy pereulok Fîcîka

Dom 7, kv. 8

Êrîvan- 37 50 78- USSR

Tel . 35. 10. 20.(mal)- 52- 97. 41(kar)

Nivîsîna bi tîpa latîni: Edoyê Simkoyê Mikoyê Elîyê Dûmanê Kelboyê Omo xelkê kela Makê

25.8.2011

Neşirxana hukneş

Glavlitn 8189(b)

Neşir n 2618

Tembî n 1447

Tîraj 1000

Rêdaktor: Emînê Evdal

Rêdaktorê têxnîk: G. Zênyan

### **Girr ji netemizyayê biter dive**

Ji nexweşîya yek jî girre. Girr nexweşîke eyane. Meriv tune, ku dereqa gurîbûnê da nizan be. Zef hema ji nexweşîkirina cane xwe gurîbûne, hene meriv jî, ku merivê bi nexweşîya gurîbûnê dîtine, li malda û cîne mayîn.

Girr hertim ji qilêrê pêşda tê, ji netemizyayê. Gurîbûn bi wandera pêşda tê, li ku meriv nav gemarêda dijîn, serhevda radizên, bi sal û zemana rûçkê hemama navînin. Hertim xwekirina wana deste kince, bû havîn, bû zivistan, xênji kincê serda kiras, derpê xwe wextêda naguhêrînin û cem nexweşa radivin, rûdinin.

Girr du pa wextê şera û xelaya pêşda tê, gava ku meriv bi hevra şerdikin û pêra jî birçîbûn tê ortê, wan çaxa nexweşîya girrê bi massayî nav merivada bela dive û ji meriva zef hindik ji wê qezayê dûr dimînin, gurî navin.

Wan çaxa gurîbûn nav gundada diha bela dive bajar pir hindikî ji wê nexweşîyê dûr dimînin. Eva yeka ji wêye, ku gund diha paşdamaye, gundî pey edetê kevn, diçin û xevata xwe bi mêtodê kevn dikin, lê bajarvan ji alîyê kûltûrê diha zanin, neku gundî, lema jî girr cîkî diha zef dive, cîyê mayîn kê.

Vê derecêda gilîyê me nivê pirê, dereq xevatçiyê kurmancadane. Xevatçiyê kurmanca hela zef gundada pey edetne kevn diçin. Avayêd xirav da dijîn, avayîne usa, çiko sal û zemana berê, bav pîrê wan dabûn çêkirinê.

Bi xevatçiyê kurmancara sal- zeman hatine girêdan ga, pez, golik, bizin, kelb(se), hesp, pişik, mirîşk. Xevatçiyê gund zef cara zivistana bi wan heywanetara derbaz dikin, cîkîda, malekê da yan jî ode û tewleyekêda. Ew xevatçiyana zivistanê çetin da heywanêt hela ji hundur jî dernaxin. Eger heywanêt derdixin jî ji hundur, sebebîya wê, rojê xweş divin, rojê dine avê jî hela hundurda didin wana.

Xevatçiyê gunda zef cara guh nadin ser xwerina xwe, kincê xwe gelek wext li xwe dikin, ew jî wextêda nadin şuştinê, guhartinê. Lema jî kincê li wan zef cara ji xûdan û qilêrê dipizinin, diperitin. Guhdarîyê li cî razana xwe jî nakin. Ew zef cara ha tewakelî radizên radikevin, radizên ser kulava, berra, bal hev, çûk û mezin cîkîda radizên. Hene meriv usa jî, ku tenê çarix û bîşmêrtê xwe dêxin bona razanê, lê kincê mayîn naêxin, bi kincava radizan. Eger ser vana jî zêdekin tiştêkî jî, wê hênê her tişt wê cîyê xwe bigire.

Ewe, hene meriv, ku heta axirîya xwe jî rûçkê hemana navînin, avê li xwe nakin, bi gotinayê usa meriv gerekê avê carekê xwe ke, wextê bûyînê, yek jî wextê mirinê, tenê du cara.

Xwerina wana jî ne bi qeydekî normalê ye. Nan û xwerinê bi lez û ser pîya dixun, diçin. Ji lezbûnê nanê tisî hertim dixun. Hene meriv jî ku şeş heft roja carekê şilayê dixun, wextê dine bi nanê tisî ebûra xwe dikin.

Ahaye, ji wê yekê jî nexweşî pêşda tên, meriv zeyîf divin. Ji jarbûnê jî meriv zû nexweşîya dikevin, nexweşî ji wana digirin.

Ew yek bajarada jî diqewime, lê awqa pêşda neçûye. Pale jî zef cara temizayî davên pişt guhê xwe, temizaya malê xwe nanhêrin. Ew jî diqewime ku guhdarîya kincê temiz, xwerina pak û rehetbûnê nakin. Emirê xwe ha tewakelî dadibirînin, naçin hemama, hela merivê usa jî bîter divin, ku emirê xwe bi araq-şeravêva pûç dikin, serxweş divin. Ser vê yekê jî çermê canê meriva qenc namînin, bi nexweşîyava têne girêdan.

Bi reqemava testîq bûye, ku nava hukumata Filestanêda salê weke 60-70 hezarî merivê bi çerm nexweşbîter divin, ji wana nivî gurrî hesab bûne, wî çaxî ji 25 meriva yek gurî dikeve.

Me got, ku gurîbûn nexweşîke kifşe, eyane, lê xevatçiyê me hela wê pak nasnakin, nizanin ji ku tê û ya ewil çawa pêşîya wê bikin şer.

Girr li wan malada dest pê dive, li ku bi qilêrî ebûra xwe dikin, nizanin sabûnê didin xevatê, dereq temizaya xweda nafikirin, şernakin pêşîya sipîya (dibî), kêça û parazitê (xûnxwerê) mayîn. Ewana divêjin: kêç û sipî xwedê daye, wekî usane jî pêşîya wana gerekê şer nekin, rawirin, bera ebûrkin" ha difikirin hinik, lema jî şerê mitîn navin pêşîya wana eger em bilivin, wî çaxî ji "berêketîya" kêç û sipîya gerekê em xilas nevin. Dêmek wa, xevatçiyê me zef cara guh nadin ser kirina wan, rawira pêşîya wana şer nekin, lema jî bela xwe hema ji kirina wana divînin, nexweş dikevin, ew, çiko bizûtirî mirinê pêşda neyînin, gundîyê me guh nadin wana, dereq wan derecada awqa nafikirin. Hema ji wê bê xemê jî her nexweşî û ecêv pêşda tên.

Raste, gurîbûn meriva derbêra nade kuştinê, meriv jî namirin, lê ji wê nexweş jar, zeyîf dibin, divin hestû. Ew merivê carekê gurrî bûye, ew pak zane çetinîya wê nexweşîyê. Merivê gurî nikare raze, hêrs dive, xwe dixwerîne, canê xwe diherişîne û her tim jî bi hêsayî- rihetîyî derbaz nake. Xênjî wê meriv tu

xevata nikare bike, canê merivê gurrî sist dive, ji taqetê dikeve û tu emel pê nave, nikare bike. Gurrîbûn û usa jî nexweşîyê din dijminê sinifa pala û gundîyê xevatçîne.

Ew nexweşî wê timê jî biqewimin, eger xevatçîyê me wextêda zirara wana fem nekin û wextêda jî pêşîya wana şer nekin.

Em dikarin dijmin wî çaxî alt bikin, çîçax ku em dijmin pak nas bikin, haj qewata wî hene.

### **Gurîbûn nexweşîya massayîye**

Her welatada nexweşîya gurîbûnê biter dive cem wê nexweşîyê mezin û çûk yekin, usa jî cîsnê mê û nêr, nexweşîya gurîbûnê napirse, ku eva meriva çerm qerqaşe, eva çermreş. Her duya jî digire, eger ew xwe pak xweyî nakin, ew cîyêk meriv nekûltûrîne û bi feqîrîyê emirê xwe derbaz dikin, li wan dera gurîbûn diha pêşda tê, dive massayî. Lê li cîyê temiz da, li ku meriv diha kûltûrîne û pak jî ebûr dikin li wan dera girr deme biter dive, girr li wan dera hatîye hilanînê li Ûrîsêteda, hêna padişêda, heta şerê împêryalîsta merivê gurî ro bi ro pir dibûn.

Besa xeberê. Sala 1910- a bi wê nexweşîyê ketibûn, 4/227/000 meriv, sala 1913- a 5/422/000 meriv û sala 1914-a 5/533/000 meriv.

Sala 1910-a ji 100 meriv 30 meriv gurîbûn, lê sala 1914-a ji 100 –î 37 meriv gurî bûn. Dêmek, muqdarêkî kinda nexweş bayê 25%- î zêdebûn. Selefê gurîbûnê li gundada diha pîrbû, eger em reqemê nexweşê Ûrîsa, ya sala 1914- a hildin, emê bivînin, ku ji 5/533/000 – a nexweşa 5/022/000 gundî bûn, yê dine jî bajarvan. Bi selefava 91% gundî hesav dibûn û tenê 9% jî bajarvan. Yek jî gerekê em zanibin, ku wî çaxî gundada diman 86% cimaet, lê li bajarada 14%. Bi vê yekêva jî reqemê jorîn mera diha têne zelal kirinê.

Gundada ji her 1000 merivê 38 meriv bi girr nexweş bûn, lê li bajarada her 1000 merivî 12 meriv nexweş bûn.

Ûkraynêda sala 1913-a girr bi masseyî bela bûbû. Wê derê ji her, 10/000 merivî 658 meriv gurîbûn. Alîyê cenûb, dîsa ew nexweşî li wî welatîda, ji 10/000 merivî 657 meriv gurîbûn, alîyê nêzkaya Ûralê, ji 10/000 573 meriv nexweş bûn.

Nava hukumata

Şêwrêda bi rast: hela reqemê( hesavê) gurîya nehatîye kirinê. Lê reqemê çend nehya belune û bi wanava jî em tèn ser wê texmîna doxtira ew reqem wê diha bilind be ( ji 10- a zêdetirvin). Vê yekê wa şirovedikin, ku merivê gurî zef cara nayên hesavkirinê, nayên bal doxtira bona qencbûna canê xwe, ji wê yekê jî reqemê wana nayên girtinê. Eyan bûne nehya, ku bi çarnikalê xweva ( gund- gundîtî, pêra jî nehya) , bi wê nexweşîyê girtine, lê dîsa em têne ser wê nêtê, wekî nava hukumata Şêwrêda ancax ji 5-î heta 6 mîlyon meriv gurî bin. Eva reqema jî pir mezine. Lazime pêşîya wê bixin şer, ew jî ne bi tenê- tenê lê bi massayî, bi hukumatêra, ku bela sebaîya wê pîlanê me derengî nekevin, wextêda bèn qedandinê. Pêşdaçûna xevata me ya rêncberîyê zavod û fabrîkane.

Bi reqemê jêrînva em dikarin zelal bikin, çika çi qezîyake mezin digihîne me nexweşîya gîrrê. Em wa texmîn kin, eger her merivekî gurî salê du cara neyê ser xevatê, xên ji taqet- ketibûnê wî çaxî wê bê hesavkirinê. 12 milyon roj ( 12 milyon rojê nexevatê). Li wekî em hesav bikin, ku ji nexweşîya nivî jî nikare bixevite û heqrojê jî bona her merivekî hesav bikin 2 manêt, wî çaxî ji kîsê hukmatê gerekê derê ji 10- î heta 15 milyon manêt pere.

Zirara ha bona pêşdaçûna hukumata pala û gundîyê xevatçî barekî girane, ku pêşda tê ji paşdamayînê û zef cara jî ji neguhdarîyê. Lazime, em ji wî barê giran zûtirkê xilas bivin, şer bikin pêşîya wê nexweşîyê.

### Çêşîd û şixulkirina çerm

Gurîbûn, çawa me got nexweşîya çermê merivane, bona femkirinê, çika çawa pêşda tê gurîbûn, ji çî mena biter dive, bo wê yekê emê kin bêjin çika çerm ji çî- çî tiştane û ew bi sirîya xweda çî şixulî dike bona canê me. Çermê me ji qalînayê mîlîmêtrek nîvê zêdetire, ji zef derecanê. Ew ji sê qatane, çermê ser yanê êpîdêrm, çermê ortê, wekî tamarê xûnê têra diçin, yan dêrm û çermê binî.

Çermê ser, serçerm, sirîya xweda diha zirave ji qatê din, bin wê qatêda uzekê ruhberî yan jî efrandar hene, lê li ser qat, notla îstirûye, evê paşîn hertim teze dive, tê guhastin. Uzekê gihêştî kal, yêko mînanî îstirûne, hêdî- hêdî diweşin û dewsa wana yê teze pêşda tên. Uzekê îsturanî wextê nexweşîyê hal ( kûtêş û yê mayîn) diha zef diweşin.

Dêrm ( taxê tamara ) ji têlanin, wekî hev dikişin ( pirûjînîne ), lema jî çermê me ji wê yekê şidîyayî dimîne, wî çermîdanin fereqê mûya ( mûfereq) yê xûnê, xên ji wê têlê nêrva, qurmê mûya, cîyê niqîtkê xûdanê û bez. Ew çerm bi serçerma tê girêdan, cîyê girêdanê pêşda tê mûyê xûnê û kuta dive serê têlê nêrv. Uzekê çermê hundur bez hazir dikin.

Ew bez çermê meriva timê nerm xweyî dike, xên ji wê, ew bez meriva ji surê jî dide xweyîkirinê, berbi serçerm vedivin devê kumkê yanê girêyê bez û xûdanê. Yê pêşin du pa, bi mûyê canê meriva têne girêdan, çerm jî nerm xweyî dikin.

Lê kumîkê xûdanê belayî ser çermê me bûne, bi hesav weke sê mîlyon niqîtkin. Çerm bona xweyîkirina canê îsanet dereceke mezin digire, bê çerm meriv nikarin ebûrbikin, ji sur û germê çerm me xweyî dike. Dil- hinavê me ji nemîyê, tozê, germê û ji mîkropa çerm xweyî dike.

Şikil 1. Dereca canê meriva ( zef mezinkirîye).

A . perçê çerm bi mûva 1. Serçerm yan jî êpîdêrm 2. Dêrm yan jî derdançerm 3. Mû( pirç) 4. Qurmê mû 5. Kumkê- niqîtkê xûdanê 6. Goştê mû ( mûgoşt).

B . serçerm 1. Çermê bi îstirû, 2. Qatê rast, bi niqîtkin, 4. Qatê malfîng, d- dêrm, c. biltekê qatê çerm 1. Epîdêrm, 2. Dêrm. Çerm bi qewata xûdanê sar o germîya canê me weke hev dihêle, ji hundurê canê me dide derxistinê tiştê nekêrî organê me, tiştê nekarî organê meriva zef cara qezîya pêştatînin.

Mîz, tiştê medenîyê me lazim nînin. Çerm alî bînistendina me jî dike... bînistendinê hema 1/7 dereceyî em bi çerm hiltînin. Awa, eger çermê meriva xirav dive, em bêjin 1/3 dereceyê çerm şewitîye, wî çaxî bêftîya meriv wê bimire, çiqas jî ew şewat serrave û sivik be.

Û axirîyê, bi saya qurmêd nêrva, em her qewmandina di wextêda fem dikin ( besa xeberê, wextê tilîk me dive birîn, em pêra- pêra pê dihisin), bi çerm û nêrvava em bi tiştê derava ( yêko ji hundurê me derin) têne girêdan, yekê jî ew komekik mezin didin organê mehandinê. Ji wan yeka jî lazime, ku em diha çermê xwe nas bikin, çerm xweyî bikin ji netemizyayê û ji qezîya. Çiqas ku çerm saqselamet be, awqas meriv jîr û serxwe divin.

Bona wê nêtê jî lazime, em bi fesalî nêzîkî tiştê bivin, eger ser çerm birîn biter bivin, lazime pêra- pêra em pêşîya wan birîna bigirin, bi destî doxtira wana bidin qenckirinê. Bi wî teherî jî gerekê em şer bikin wextê gurîbûnê.

## Nişan û çetinîyê gurîbûnê

Gir belayî ser canê meriva bi tomerî nave, her dera nagire, lê dikeve cîyê xwestina xwe, cîyê xwestina wê, cîyê nazikin, orta tilîya, ser desta, ser çermê zikda, ji wana zef hema rex navikê divin, ser cîyê cinsîyê ( heyayê) û yê dine.

Îsbat bûye, ku gurîbûn ji desta, destpê dive û paşê bere- bere belayî ser can dive. Cîyê gurî dixwerin. Divin nolanî pizikê ( berboxa) reng sipî, ewna paşê bere- bere qîçik divin û divin eynî pizik. Pizik jî wextê xurandinê têne herişandinê û kê ( zox) ji wana dertên, paşê bi çermekî hişkva dîsa têne girtin.

Nişana wê nexweşîyê di sirîya ewlinda xure, xur pêşda tê, bi wî navî jî (xur) wê nexweşîyê nas dikin.

Wextê şeva û germîyê xur bi gumruhî destpê dive. Wextê xurandinê gurî bi neynokê xwe tenê xwe naxurînin, lê ewana pê tiştê zivir jî xwe dixurînin, pê neynûka xur nayê şikandin, ewana zef cara pê pirtîyê emirkan çotka û tiştine mayîn xwe dixurînin. Xur du pa destpê dive ji desta û cîyê nazik. Wextê xurê gurîbûn diha bela dive. Birîn bi komkom pêşda tîn. Dorê birîna sor divin, hinekî diwerimin, axirîyê jî divin eynî birîn. Birîn jî pêşda tînin şewatê, êşê.

Wextê gumruhbûna girrê meriv ji xewê û rehetbûnê tîn birînê. Pêşda tê sistbûn, meriv taqet dikeve û xevat jî bi wana nave.

Merivê gurî eger wextêda xwe nedin qenc kirinê, halê wana xirav dive, canê wan tîn neqşkirinê bi birîne mezinava, ew birîn jî eger qezîyakê neyînin serê nexweş, lê dîsa nexweş dikin halekî lapî nepak, halê nemir- nejîyê. Ji wê jî, eger nişanê gurîbûnê neyse xwuya bikin, lazime nexweş derbêra here cem duxtor. Bê duxtor nexweşîya gurîbûnê bi xwe – xwe nayê qenckirinê, kutabûnê.

## Gurîbûn ji çi peyda dive

Hela çend hezar sala pêşda duxtorê hurum bi nexweşîya gurîbûnê hisya bûn. Wana teqmîn kir, ku gurîbûn pêşda tê ji curekî tîz. Ew tîz zef hûrike. Bi çavava meriv zef çetin divînin. Ew rawir dimîne nava heywanet, nav hespa, gamêşa, dêwêr, kelba (kûçik), pişîka û di sirîya xweda heywanêt jî gurî dêxe.

Tîz gurîbûn û nexweşîyê pêşda tînin, eva yeka eyan bû hela qirnê 12- a da, lê axirîyê ji şikê, meriva tîz bîrkin, dijmin bîrkin. Pey wê fikirê, ku gurîbûn ew ji hundurê meriva pêşda tê, tiştê neqenc hene hundurê merivada û ew wextekî pêşda tîn, derdikevin û ji wê jî gurîbûn pêşda tê.

Axirîyê sala 1834 duxtor Rênûçê dîsa îsbat kir, ku rastîyê gurîbûn ji tîzê ye. Tîzê gurîbûnê parazîtekî zefî hûrike, bi form gilovere, zû- zû diheje, bi rengê sipî- qîçik neyse diçirûse. Tîza mê diha gire, yê nêr hûre. Dirêjaya tîzê weke 1/3 mîlîmêtre, beraya wê weke ¼ mîlîmêtre. Piştî tîzê wa bi qeydekî werimîye, pirçe ziravik ser wê hene. Ser zikê wê 4 cot ling hene. Tîzê nêr dijîn ser rûyê çerm, cîyê şil, rex cîyê tîzê mê, tîza mê bi devê xwe çermê meriva diqelêşe, dikeve bin serçerm, digihîje dêrmê û hema li wêderê jî hêlîna xwe datîne. Hêlînêda hêkek tine û xwe jî hişk dive.

Şikil 2. A: Tîzê nêr

B: tîza mê

C: - xeta tîza mê bin serçermda, wê derê jî hêk kirîye

Her tîzek mê ji 20 heta 50 hêka dike, ew hêk jî 15 roja şûnda divin tîz û dîsa hêk dikin. Cotek tîzê mê û nêr nava 3 mehada dikarin milyon û nîvekî tîza pêşda bînin. Ji vê yekê em tên ser wê fikirê, ku çîqa zû nexweşîya gurîbûnê dikare nava merivada bela bive, pêşda here.

Çîçax ku tîz çermê meriva diqelêşînin, wan çaxa şewat (xur) diha pêşda tê. Şewat wan çaxa jî gumruh dive, çîçax ku tîz zû- zû zef divin, dixevitin. Ew jî wan çaxa divin, çîçax ku çermê han jî nav cî- nivînadandin , wextê razanê. Tîzê nêr qezîyake awqas mezin nadin meriva, ew dijîn rex tîzê mê. Ew tenê tîzê mê merdikin, idî tu zîyanê nadin nexweş, canê wana nadin êşandinê, ewana canê meriv qul nakin û zû jî qir divin.

Muxdarê destpê bûna gîrrê 7 roja hesav dikin, heta gumruhbûna wê.

Gurîbûn li ser canê merivê temizhiz awqa bela nave, gîrr dikeve cî- cîya û axirîyê zef nave, disekine. Lê gurîbûn ser merivê temiznehiz bi carekêva bela, her derê wî gurî divin.xên ji gîrrê notla hingil, eyane gurîbûna Norvêgîyayê jî( qalê papûlêûsê pûstûlênûsê). Eva nexweşîke usane, ku ser canê meriva pêşda tên gîrrê mitîn û zivir, cîyê wana dupa ser desta û lingane. Meriv gava wana diherişîne, wî çaxî pêşda tên birînê nem (şil) û hema li wandera jî tîzê mê û nêr rûdinên ( cî- digirin).

Wê derê hêka dikin, tîz pêşda tên. Nexweşîya Norvêgîyê gelekî dikişîne, eger em dixwazin ji vê zû xilas bivin, lazime zûtirekê elamî duxtor bikin.

### Şikil 3. Nexweşîya gurîbûnê

Nexweşîyê wî televî- xironîk, qezîyayê mezin zef cara pêşda tînin. Awa, meriv bi nexweşîya nêrva zef cara wê nexweşîyê diwekilînin, care din jî wê nexweşîyê dikevin, diwekilînin.

Tîzê gurîbûnê wan çaxa ji yekî derbazî yekî din divin, çîçax ku meriv bal hev radizên (rex hev) , wan wexta , çî çax ku hatin çûyîna merivê canqenc û gurî bi hevra hene.

Gurîbûn bi tîzeke mêva jî dikare bela bive, pêşda diçe. Bese ew tîz bi kincava yan jî bi tiştêkî dinva derbazî ser merivê canqenc bive û ji wê şûnda gurîbûn destpê dive. Ser vê yekê jî em divêjin, ku nexweşîya gurîbûnê ji merivekî derbazî merivekî din dive, nexweşîya jê hilsnîne. Bi wî qeydeyî nexweşîya gurîbûnê tîz pêşda tîne, ew jî ne ji hundura, lê serçerm.

Nexweşîya gurîbûnê çawa hate gotinê, li wandera bela dive, li ku meriv bi kom cîkîda radizên. Cîkîda dijîn, temizaya wana tune, wextêda naçin hemama, avê xwenakin, wext- wext kincê xwe binî naguhêrînin û eva yeka du pa li gundada diqewime. Yek jî nexweşîya gurîbûnê nav wan xebatçiyada diqewime, yê ko bêmalin, bêtişt û ji taqet ketine- çawa ku welatê kapîtalîstada hene.

Heywan jî gurîbûnê bela dikin, ew jî li gundada, hertim jî gamêş, ga, hesp, se û pişik bi nexweşîya gurîbûnê dikevin û hema ji wana jî gundîyê bêfem gurîbûnê hiltînin.

Gurîbûn ji nexweşîyê dine başqetire. Merivê gurî zû tê belûkirinê. Merivê şereza dikare bi nexweşîya wî bihese, zanibe, ji pizika, ji kêmê û ji birîna. Tiştik jî, meriv pê serê derzîya tîz jî dikare derxe ji çermê merivê gurî. Lê ew yek duxtor dikare bike. Duxtor dikare temîya bide û tîza bide kuştinê, ji canê merivine usa, yêko bi meh û sala gurîbûne.

### Şikil 4. Hespê gurî

## Şer pêşîya gurîbûnê

Pêşîya gurîbûnê bi du- dermana jî şer dikin. Şixulê pêşîn, ewe, ku merivê gurî bidin qenckirinê, ji halê wî bidin derxistin û bidin kutakirinê tîza, wekî di sirîya xweda ew jî derbazî ser xelqê navin. Ya duda ewe, ku em merivê nexweş bidin xweyîkirinê, wana pak bidin xweyîkirinê, bi fesalî wanava derbaz bikin, wekî nexweşîya wana dîsa nayê wekilandinê.

Girrê em zû dikarin bidin qenckirinê, eger zû lê bipirsîn, dû derman bikin. Gunda da divek hevin meriv, yêko diçin, cem pîrik û koçeka û ji wê yekê jî qezyake mezin tînin serê xwe. Merivê nexweş han jî bêkêf gerekê bê eglebûn here cem duxtora şiroveke û miqîm bi temîyê wî jî xwe bidin xweyîkirinê, qenckirinê. Bi qewata dû- dermana şerkin pêşîya gurîbûnê.

Cûrê qenckirina nexweşîya girrê başqe- başqe ne. Ewe, çika merivê gurî bal kê tê dermankirin, ji kîjan cîyê, çend salî ye û girrê çiçax pê girtîye.

Cem me, em merivê gurî ha derman dikin. Wana ewil dişînin hemama, canê wana didin şûştinê, paşê canê wana bi tomerî pê dermanê eksî gurîbûnê mizdidin. Rûn li canê wana dixin, awqasî lêdixin, heta ku çermê nexweş wî rûnê dikşîne xwe, dimiçiqîne, kincê wana jê dêxin û başqe dikin, kincine din didin wana. Didin guhêrandinê sipîçala, rûbalgîya, lêhêfa. Rûn 3 roja li çermê merivê gurî dixin, ew jî rojê du cara, sive- sive, êvar – êvar.

Pey wê yekê merivê gurî dişînin hemamê, bi sabûna hêşîn canê wî didin şûştinê û yekê jî dîsa kincê wî hemû diguhêrînin. Eger nexweş ji wê şûnda qenc neve, gerekê wî dermanî (rûnî) dîsa bi qeydê ewil lêxin, dermankin. Rûnê miqabilê girrê, rûnê vîlkînos e. Eva rûna bal me gelekî tê xevatê û ji wî rûnî her dermanxanada heye, tê biter kirinê.

Wî rûnî ha hazir dikin, hildidin 40 giram kirkût dîyogit ji wê du cara zêdetir. Tevî wana dikin sabûna hêşîn û bezê xinzîr yan jî rûnê nivîşkî bê xuyê(xoy), paşê jî dikin ser wana 10 giram toza tebeşûr. Wana gişka tevîhev dikin, paşê dikutin heta rengê jê tê istendinê. Rûna ha, meriv malada jî dikare bide hazir- kirinê û bide xevatê.

Rûnê vîlkînos gova duguhîje qulê tîza, tîza dide kuştinê û pêra jî çermê meriva bere- bere dide qenckirinê.

Xên ji wî rûnî mêtodek jî heye, wêra divêjin mêtoda Fîransîyê, eva cûra zû dide saxkirinê. Wî rûnî jî bi qeydekî ha hazir dikin, ewil pizikê ser çerm didin hildanê û paşê rûnê eksîgirrê lê dixin. Bona hîlanîna pizika(berboqa), canê nexweşa bi sabûnê didin şûştinê. Paşê wana weke niv sehetê nav germîyêda dihêlin. Bi wî cûreyî pizikê ser çerm nerm divin û ji wê şûnda têne- xarê, diweşin . pey wê yekê canê nexweş bi rûnê kirkûtva didin mizdanê. Roja dine nexweşa didin rûniştinê vane germda û rûnê ser çerm bi sabûnê didin şûştinê, ku ji çerm here. Pey wê yekê çerm ziha dive. Nexweşî eger bi wî teherî nehate qenckirinê, lazime wî dermanî (qeydeyî) dîsa bidin wekilandinê, lê ji 15 roja nezûtir, çermê zara zef nazike, pizikê ser çermê wana gerekê bi cûrekî din bê qenckirinê. Zara usa nadin dermankirinê, çawa ku merivê mezin derman dikin. Wa dikin, êvar- êvar zara bi, balasê pêrûr mizdidin- berî razanê, lê sive- sive wana dikin nav vana germ yan jî vana avkûrkût.

Çend roja bi wî qeydeyî dadibirînin. Balasê pêrûr xên ji saqkirina girrê, çermê meriva ji pizikê jî qenc dike û kinca, notlanî dermanê din xirav nake.

Em çawa pêşîya nexweşîya gîrrê bigirin gava ku malekêda gurîk, han dudu û sisê hene, lazime ew gişk jî bihevne bêne dermankirinê. Bê vê yekê gurîbûn hertim jî dikare bê wekilandinê, ji yekî derbazî yekî din bive. Ew cîyêk gîrr lê biter dive, lazime bi carekêva ew der temizkirinê, kinc û nivîn gerekê bêne kelandinê, wana raxin ber tavê û wextê usada miqîm bi temîyê doxtir ravin- rûnên. Wan wexta pencere û pol gerekê bi ava sabûnê va bêne şûştinê, keravata jî bişon( temizkin) bi ava kelandîva, ku tu parazit li malada nemînin.

Bi şerezayî gerekê heywanet binêrin, heywanê gurî veqetînin û ji malê û ji pêz- dêwêr wextekî dûrxin, çimik ew xwe jî gîrrê bela dikin. Se û pişikê nexweş gerekê bidin undakirinê. Gundada edetekî zefî pak heye gundî serê biharê û axirîya payîzê nîrkêşa bi ava germ û sabûnêva dişon, pey wê yekê neftê han jî rûnê zegerek li canê wana dixin û dihêlin ber tavê. Neft û bizirê tel dermanin, ew parazitê, usa jî tîzê gurîyê dikujin. Lazime herkes jî rind zanbe, ku gurîbûn ji netemizyayê ye, bona wê nêtê jê şer gerekê tûjkin, pêşîya wê ( netemizyayê), şaşîyê dikin ew meriv, yêko divêjin gîrr ji kesîbî ye.

Gele- gelek kesîb hene, lê gurî nînin, çimik ewana xwe rind xweyî dikin, temiz xweyî dikin, lê zef dewletî jî bûne, ku gurî bune, çimik wana xwe temiz xweyî nekirîye. Tewekelî derbaz kirine.

Şer pêşîya nexweşîya bi tenêti nave, lazime cimaet bi komî hazirve, lazime cimaet bi komekdarîya hukumatê bixevite û bi tifaqî şer kin pêşîya her nexweşîya. Bona wê yekê jî lazime ku, cimaet bi kûltûrnîve, zanive qedirê temizayê, ji orta xwe hildin wî edetê kevn, çiko zirardare, ji berêda hatîye, dewsa wana bidin çêkirinê edetê sosîyalîstîyê bidin çêkirinê avayiyê teze, cimaetê bi nivîsar û ezberî bidin femkirinê ji allîyê zirardayîna nexweşîya û ya gîrrê.

Lazime, ku herkes zanibe, wekî razana cîkîda zirare, ku hemam bona temizayê cîyê ewlin, digire ku bi sabûnê gerekê kincê û destê xwe bidin şûştinê, ku wextêda kiras- derpîyê xwe (kincê binî) usa jî yê ser bidin kelandinê, şûştinê, ku nivîna û kincine mayîn gerekê hertim raxin ber tavê. Ji wan yeka jî çermê me wê temiz bimîne, ji wê jî meriv diha ser xwe dimîne, ji dûrî nexweşîya.

Bona wê nêtê her merivê kûltûrnî jî dikare merivê dora xwe serwest bike. Meriv pêşîya her nexweşîya dikare şer bikiye, eger ewana bi massayê zanibin dereq dijminada û bi massayî jî ravin pêşîya wê şerbikin, gava ku herkes zanibin, çika mîkrop çî ne, çawa bela divin û çî- çî qezîya pêşda tînin.

Vê derecêda gotin bes nine, lê lazime kirin jî bi komekdarîya hukumatê û teşkîlê mayîn, eva şixula gerekê bê sêrî. Gundî hela dijmin (mîkropa) nas nakin, lazime wana bidin hînkirinê û bi hînkirinêva jî şer tûjkin pêşîya her nexweşîya. Lazime li her gundada hemam bèn çêkirinê, yek jî sabûn bol be, ku cimaet xwe temiz xweyîke.

Gîrr ji kesîbîyê nine û ew yek nikare bive, mene, lazime temizaya miqîmî. Welatê bi kûltûra bilindda nexweşîyê jêhilanînê hatine birînê. Cimaeta wan dera rind fem kirine kara temizayê û ji wê jî ew nexweş nakevin. Li ser zarongê hûrik lazime guhdarî heve, cîyê ku doxtir lê henin ew bi komekîya dersdara deyndarin lê binêrin, cîyê ku duxtor lê tunenin, li wandera jî dersdar gerekê guhdarîya zara bikin, hertim ji alîyê temizayê komekê bidin zara, wana hînî temizayê bikin.

Zaro gere çermê wî pêşda tîn, lazime pêra- pêra duxtor bi şagirtva (zarova) bihisînin.

Bi gilîkîva gerekê her şerezayê me tanga xweda guhdarîyê li temizayê bike, şerke pêşîya nexweşîya, pêşîya gîrrê.

**Lozûng**



- 1.Girr nexweşîke bela bûye.
- 2.Girr ji netemizyayê pêşda tê.
- 3.Wextê şerra û xelaya girr diha bela dive.
- 4.Nexweşîya girrê gundada zef belaye, bajarada ew nexweşî kême.
- 5.Girr ji nekûltûrbûnê û ji paşdamayînê pêşda tê.
- 6.Girr meriva nakuje, lê merivê gurî lap hal û maş divin, ji taqet dikevin.
- 7.Girr meriva ji xevatê paşda dêxe.
- 8.Girr nahêle ku meriv xevateka baş bike.
- 9.Girr dijminê pala û kolxozvanane.
- 10.Eger em dixwazin ji gurîbûnê dûrvin, lazime em zanivin, çika ew çawa pêşda tê û ji çi biter dive.
- 11.Cem nexweşîya girrê çûk û mezin merivê can reş û can sipî yekin, wana gişka jî digire.
- 12.Ji nexweşîya girrê hebûna gundîya û nederê paşda dimînin.
- 13.Girr nexweşîya çerme.
- 14.Çermê nexweş zirarê digîne me.
- 15.Merivê gurî ne radizê, ne rehet dive.
- 16.Tîz gurîbûnê pêşda tîne.
- 17.Gurîbûn merivê binêrv û xarinkêm diha dêşîne.
- 18.Girr nexweşîya jê hilanînêye (musrî).
- 19.Jêhilanîn, wî çaxî dive, çîçax ku tîza merkirî ji merivê nexweş derbazî merivê qenc dive.
- 20.Jêhilanîn du pa diqewime wî çaxî çîçax ku meriv cî- nivînekîda radizên.
- 21.Girr ji heywên jî tê hilanînê, ew jî gurîbûnê pêşda tînin.
- 22.Nexweşîya girrê zû tê naskirinê.
- 23.Bi çarnikal pêşîya girrê gerekê şer bikin.
- 24.Girr wê zû bê qenckirinê, eger duxtor derman bike.
- 25.Merivê xwendî û bi kultûr zane xwe xweyîke ji nexweşîya girrê.
- 26.Welatê kultûrda girr jê hatîye hilanînê.
- 27.Sabûn dijminê gurîbûnê ye.
- 28.Bi xevtandina sabûnê tê kifşkirinê cimaeta kultûrnî(medenyet).
- 29.Eger malekêda nexweş zefin, lazime ewana bi hevra bên dermankirin, qenckirin.

30. Pey qencbûnê, kincê nexweş bi carekêva gerekê bêne temizkirinê, kelandinê, şuştinê. (yan jî bavêjin derva).
31. Heywanê gurî yê gir, gerekê bêne dermankirinê, lê pişik û seyê gurî gerekê bidin kuştinê.
32. Hemam gundada gerekê eseyî bèn çêkirinê.
33. Temizayî ji pêra nine, lê ji xwestinêye.
34. Gava ki nexweşik dest pê dive, lazime duxtor pê bihisînin.
35. Rasthesavkirina reqemê gurîya, dereceke şerê pêşîya gurîbûnê.
36. Bi qewata massayê gerekê li her dera şerkin pêşîya her cûre nexweşîya.
37. Gerekê hertim zanibin, ku qurmê nexweşîya û girrê netemizya ye û pêşîya wana em bi temizayê dikarin şer bikin.
38. Kesîbbûn gerekê neve mene, wextê nexweşîya, gelek kesîb hene, ku ji dewletîya temiztirin.
39. Şer jibo temizayê.
40. Şer pêşîya edetê kevnî berê.

#### **Navnîşa miqala**

**Girr ji netemizayê biter dive**

**Gurîbûn nexweşîya massayîye**

**Çeşîd û şixulkirina çerm**

**Nîşan û çetinayê gurîbûnê**

**Gurîbûn ji çi peyda dive**

**Şer pêşîya gurîbûnê**

**Bi qewata du- dermana şerkin pêşîya gurîbûnê**

**Em çawa pêşîya nexweşîya girrê bigirin.**

**Lozûng**

**GIRR**

**Terceme kir:**

**Hecîyê Cindî**

**1933**

**Neşra hukumata Şêwra Filistanê**

**Rewan 1933**

**Duxtor A. Qazarîyan**

**Tîpguhêzî ji Kirîlkî bi tîpa Latînî**

**Edoyê simkoyê mikoyê elîyê dûmanê kelboyê omo xelkê kela make**

**26.8.2011**